hejmar 19 havîn 1996

KURMANCÎ

rojnameya taybetî ya Enstîtuya kurdî ya Parîsê li ser pirsên zaravê kurmancî

Min ev nivîsî ne ji bo sahibrewacan
Belkî ji bo biçûkêd Kurmancan

Ehmedê Xanî
(Sedsala XVII)

Dem û rojên *bi nav û nîşan*

Amadekar : **ELÎŞÊR**

Newroz : 21ê adarê (zayînî) (di teqwîma kevn a rûmî de 9ê adarê bû)

Adar e dew li dar e

Adarê berf hat guliyê darê
Sibe lê nebû êvarê

an

Adarê berfê da guliyê darê
Nema heta êvarê

Adar e, dew li dar e
Ne li vir, li Kewkeb û Sincar e
Li ba şivanê xumal
û kebaniya bi kar û bar e
(li ba koçerên Kîkan)

Newroz newroza kalanî
Dar gopalê xwe hilanî
Zivistan û bihar ji hev deranî

Hivde : 17ê adara rûmî; di vê rojê de xelk, xort, jin û keç diçin ser ziyaretê. Ji bo du sê rojan, şahî û bazar saz dibe û dibe wek karnavalekê. Di wan rojan de keç revandin mubah e.

Hivde xericî, Eyş nedericî
(Cejna hivde derbas bû dîsa Eyşê di mal de ma, qismetê wê venebû).
(li navçeya Silîva û Mûşê).

Hêkesor, zadîk : di dawiya adarê, destpêka nîsanê de ye; hêkan dikelînin û bi rengê sor boyax dikin. Bi hêkên sor dileyîzin. [(t) paskalya, (f) pâques, (i) Easter].

Avêtik, gamêşqiran : 20ê nîsanê (7ê nîsana rûmî); berf êdî dihele, kêm dibe. Avîtik befrê avête qirika dîk.

gamêşqiran : li gor riwayetekê, di 7ê nîsanê de teyrok bariyaye, 7 gamêş bi hev re mirine. Ava barana 7ê nîsanê dermanê zerikê û çavêşê ye.

Di avêtikê de bibare bihar e, nebare xedar e.

Serê gulanê : 13ê gulanê (1ê gulana rûmî) : di vê rojê de her kes kincên xwe yên bedew li xwe dikin, derdikevin çol û çixariyê. Di wê rojê de li mala xwe mayîn bêoxirî ye. Divê herkes li derva be. (li deşta Silîva).

Çil 'esir : ji 22ê adarê dest pê dike, çil rojan dom dike; di wî çileyî de her roj dana 'esrê baran dibare [(t) kırk ikindiler].

Cejna zozanan : şahiya çûyîna zozanan, di hefteya pêşin a hezîranê de (Li navçeya Serhedê).

Rojveger : 21ê hezîranê (berê di 9ê hezîrana rûmî de pîroz dikirin) ; roja dawiya biharê, destpêka havînê ye.

Qurix : demeke ku havîn dişkê, ber bi payizê ve diçe.

Berxbirîn an berxbir : : li aliyê Wanê û Bidlîsê jê re **vartîvar** dibêjin. 23ê tîrmehê (10ê tîrmeha kevn) ye. Wê rojê diçin ciyekî kifş ji bo çixariyê, şahî dikin, berx dibirin.

Gûzweşînk : dema weşîna gûzan, di payîzê de.

Nan û tirî : ji 15ê îlonê de dest pê dike; dema ku tirî ew qas pirr e ku êdî bi nan re tê xwarin; di wê demê de qewlê şivan û gavanan jî xelas dibin. Ev dem qasî du hefteyan dom dike.

Rezçinîn : dema çinîna rezan e; di payîza navîn de ye.

Korkud : rojvegera zivistanê, 21ê kanûna pêşî (9ê kanûna rûmî).

10ê kanûnê, rojê berê xwe da havînê.

Civîna Biskops Arnöyê ya 19emîn

Civîna 19emîn ya *Kurmancî* li Biskops Arnö (Swêdê) di navbera 31ê adarê - 6ê nîsana 1996an de çêbû. Di vê civînê de kesên beşdar li ser *dem û rojên bi nav û nîşan; termên hiqûqî; îdyomên kurdî; devoka Qerejdaxê; termên aborî û peyvên li ser nîşanên demên salê û guhurîna hewayî li hêla Hekariya* xebitîn.

Di vê civînê de, Mustafa Aydogan (Qiziltepe), Lutfî Baksî (Xerzan), Rojen Barnas (Diyarbekir), Salim Çeliker (Diyarbekir), Elîşêr (Wan), Rojan Hazim (Hekarî), Hemîd Kiliçaslan (Mêrdîn), Mehmûd Lewendî (Qerejdax), Kendal Nezan (Diyarbekir), Zinar Soran (Dêrik), Veysi Zeydanli (Bidlîs), Zeynelabidîn Zinar (Xerzan) û Reşo Zîlan (Agirî) beşdar bûn.

Ji 10ê kanûna rûmî, 22ê kanûna teqwîma nû êdî roj dirêj dibin.

Xaç : 7ê kanûna paşî (rûmî) : roja ku bi merasim xaç davêjin avê, kehanet dikin ku dê sal çawa derbas bibe (20ê kanûna paşî). Çile : 20 roj ji kanûna pêşî û 20 roj jî ji kanûna paşî ye.

Xidirnebî : 21ê kanûna paşî (rûmî); 4ê sibatê. Ji 7ê kanûna paşî yanî ji roja xaçê heta 21ê mehê. Roja Xidirnebî, zivistan dijwar e.

Xaç û Xidirnebî
Wey li halê wî li mala xwe nebî
Şîv hebî taştê tûnebî

Roja agir ; agirê Filan : li Bidlîsê jê re xetre dibêjin. 14ê sibata rûmî (27ê sibatê) ye. Agirê roja leyz û govendan e; wê evarê xelk êzingên hişkkirî (xitre) an daran vêdixin, bi saetan şahî dikin, govend digrin. Li gora mezinan mirov bi vê leyz û govendan gunehên xwe diweşînin. (f) *carnaval de février*)

Zîp : çarşema reş; roja çarşema hefteya dawîn a meha sibatê (rûmî) ye. Wê rojê pîrê (caziyet an keça şeytan) diçe mala bavê xwe û hefteyekê şûn de vedigere. Di vê hefteya bê oxir de (26ê sibatê - 5ê adarê) tawî û bawî diçin ser ziyaretan, serê por tên qusandin (jê re zîp kirin dibêjin), tiştên kevn tên avêtin, bi hêviya ku êş û elam û dijwarî bi wan re bên avêtin. Di çarşema destpêka vê heftê û di ya dawiya heftê de cejn û şahî tê kirin. Wan çarşeman kes xwe naşo, berav nakin, nan napêjin, neynok nabirin.

Sersal : serê salê li gora teqwîma rûmî; şeva 13ê çileya teqwîma nû ye.

Serê salê binê salê
Xwedê bihêle malxweyê malê

an

Xwedê kurekî (keçekê) bide vê malê

Gîskfetisîn; gîskoguro : 28ê sibatê (rûmî); 13ê adarê. Karê xwe li ser lat hilor dikir, lotik didan û digot ;

Tirt û tirt sibatokê
Derketim adarokê
Min xwarî gangilokê...

Sibat, li ser karê dibêje ;

Xweha min î adarê
Bide min du rojên xedarê
Da ez karikê
Ji ser latê bînim xwarê

Pîrek ji Tora Banî (Mêrdîn)

Çend gotinên li ser nîşanên demên salê û guhurîna hewayî li hêla Hekarîya

(Ev nîşane, di nav xelkê da li gor serpêhatî û hejmariya demên salê yên kevin hatine danîn.)

Amadekar : **Rojan HAZIM**

Baxore : Kesê ku ji hewayê dizane anku hewazan, meteorolog.

Bêrdexe : dûmahîka heyva kanûnê (kanûna pêşîn) ye. Nîşana hatina befira giran e û destpêka çilê zivistanê ye.

Heyhot : dûmahîka (anku roja 31ê) heyva çile anjî kanûna paşîn e.
Li ser vê metelokek jî tête gotin : (du versiyon in)

1 - *Heyhot û heyhot*
Ser me ve çûn
her çar heyvêt cot
Babê êkê çû kur firot
da bi kezwanek û kevot

2- *Heyhot û heyhot*
Hatin herdu heyvêt cot
Babê kur firot, da bi dar û sot
Dayê kiç firot, da bi kezwan û kelot

(Heyvcot: Ji ber ku di nav xelkê da herdu heyvên dûmahîkê yên payîzê û herdu heyvên pêşîn yên zivistanê wekî «çirî, çirî û kanûn, kanûn» têne zanîn, lewma jî bo wan heyva, heyvêt cot têne gotin.)

Şevzengil : Ji bo sihê heyva çile (kanûna paşîn) tête gotin. Ev nîşane li ser bûyerekê hatiye danîn :
Li welatê Hekarîya; mirovekê sê kur û sê bûk hebûne. Ev mirove, yekî zana û serwext bûye. Şeva berî heyhotê anku sihê heyva çile (kanûna paşîn) hemû li mal rûniştine. Mêrik di nişkê da guhên xwe bel dike û dibêje biçûkêt xwe ku bêdeng bin. Dengekê ji kêriya (zinarên biçûk yên li dora gund) pişta gund dibihîze. Hema dibêje ku ev şeve dê befireke giran bêtin. Kurên xwe radike û dibêje ku biçin gayê xwe ser jê bikin. Dibêje bûkên xwe jî ku haziriya kelandina goşt bikin. Ga têtе ser jê kirin û qazan li ser agir têne danîn. Di vê demê da ew bi xwe jî dareki 2-3 bihosta dirêj tîte û zengilekê bi serî ve girêdide û diçe ser ban û diçikilîne. Befir dibare, hem jî bêsekinîn. Ew li jor dest bi xwarina goşt dikin. Gava dengê zengilê disekine kurêt xwe rêdike ser ban ku befirê bimalin. Heta sipêdê vî karî didomînin. Bi vê yekê ji bin befira giran xilas dibin. Sipêdê derdikevin gund ku çi bibînin! Gund pêkve maye di bin befirê da û mirov hemû fetisîne. Tenê ew xilas bûne. Ji wê rojê pê ve, şeva berî heyhotê wekî şevzengil bi nav dikin û eve li nav xelkê dibe nîşanek.

20ê sibatê : Hatina firindên sorewêr yên koçer e. Nîşana guhurîna hewa ye. Anku sarma dişikêt.

Zîpe an jî **zîpik** : Du cure zîpe hene : **zîpêt sibatê** : Çar rojên dûmahîka sibatê zîpên sibatê ne; **zîpêt adarê** : Çar rojên pêşîne adarê jî zîpên adarê ne.

Gava zîpeyan dest pê kir, êdî seqayê hewa dişikêt û hewa ber bi germê ve diherike. Di zîpeyên adarê da, av li dara digere û eve nîşana hatina biharê ye.
Li ser zîpeyan çend gotin jî hene:

Berî zîpeyan heşt roja heke befir bibare, hingê befir zêde dimîne anku direng dihele. Belêm, piştî zîpeyan heşt roja befir bibare, namîne û zû dihele.
Li ser befira piştî zîpeyan metelokek jî heye:

18ê adarê 18 bihostêt befirê hatine xwarê
Xwe negirt heta danê êvarê

Agirxweşî : 9ê adarê, bi manaya «xweşiyê», agir tête hilkirin.

Avetîkêt nîsanê : 10 rojêt serê nîsanê ne. Carina heta 20ê nîsanê jî diajon. Di vê demê da baran gelek dibare û hewa sar dibe. Heke baran bibare dîsa hewa gerimtir e. Belêm, heke hewa sahî be ji çilê zivistanê jî sartir dibe. Di nav xelkê da wekî nîşana sarma biharê têtê zanîn û nexweşî pê têt. Nexweşiyên wekî *ta* û *persîfê*.

Stêrêt pêrû, pêwir : Eve komestêr in û wekî şilxê mêşan e. Nîşana hatina havînê ne, ji milê rojhilatê ve têne dîtin. [(t) ülker, süreyya yıldızı, (f) la pléïade, (i) the pleiade.]

Stêrêt terazî : Ev stêre jî 25ê hezîranê ji milê rojhilatê ve têne dîtin. Komek in. Sê li milê rastê, sê jî li milê çepê û yêk jî di nîveka wan da wekî terazîyê xûya dibin. Lewma jê ra stêrêt terazî dibêjin. Nîşana destpêka çilê havînê têne zanîn. [(t) terazi takım yıldızları, (f) constellation balance, (i) libra.]

Çilê havînê : Ji dûmahîka hezîranê heta 20ê tebaxê dom dike. Kela hewayî bilind e.

Stêrka gelavêj, qorix : 15-20ê tebaxê, stêrka gelavêjê derdikeve. Ev stêrke nîşana şikestina germa hewa ye. Hewa ber bi sarmayê ve ye. Piştî stêrka gelavêjê derket, dewar li ser tewlê nayên girêdan. Wekî nîşana xilasiya havînê têtê zanîn. [(t) çoban yıldızı, (f) étoile du Berger, vénus, (i) shepherd's lamp, Venus.]

Li ser hatina stêrka gelavêjê nîşanek jî têtê gotin: Sipêdê here binê dara kezwanê, heke te belgêt zer dîtin ew nîşana derketina gelavêjê ye.

(Stêrêt Perû, terazî û gelavêj heta serê kanûnê (kanûna pêşîn) li esman in. Serê kanûnê ava dibin. Eve jî wekî nîşana hatina zivistanê têtê zanîn.)

Canemêrg : Kulîlkek e, ji 10ê îlonê pê ve derdikeve. Nîşana payîz û sarmayê û destpêka çandina payîzê ye.

10ê îlonê : Eydil silîv e. Adû, anku mar, kimkime, dûpişk, kêvcale, kirim û ev cûre heywanên dikevin binê axê. (Adû, heywanên xwûşikîn in).

Aveşûtik : Dema baran gelek dibare ji beten û pesara ber bi dolan ve aveşûtik çêdibin. Nîşana lehiyê ye. Gava aveşûtik hatin divê ji wan dera dûr bikevin... [(t) yamaçlardan hızla akan su akıntı ya da derecikleri, (f) torrent, gave, (i) torrent.].

Termên aborî

Amadekar : **Salim ÇELÎKER**

kurdî	tirkî	fransizî	îngilîzî
aborî	ekonomi, iktisat	économie	economy
binavahî	altyapı	infrastructure	infrastructure
butçeya salane	yıllık bütçe	budget annuel	annual budget
daxwazî	talep	demande	demand
derbas bûn, derbas kirin	transfer edilmek, transfer olmak	être trasféré	to be transfered
veguhastin, guhastin	aktarmak, transfer etmek	transférer	to trasfer
deyndêr	alacaklı	créancier, créditeur	creditor
hêvî	beklenti, umut	espoir, espérance	expectation
hêza kirînê	satınalma gücü, alım gücü	pouvoir d'achat	purchasing power
jêkêm	açık	déficitaire	in deficit
jêkêmî	açık	déficit	deficit
jêkêmiya butçeyê	bütçe açığı	déficit budgétaire	budget deficit
jêzêde	fazla, artık	excédentaire	excess

jêzêdeyî	fazlalık	excédent	surplus, exess
jêzêdeyiya butçeyê	bütçe fazlalığı	excédent budgétaire	budget surplus, budget exess
mişehî	bolluk	abondance	abondance
nesafî	gayri safî, brüt	brut	gross, crude
pêşkêşî	arz	offre	supply, offer
pêşkêşî û daxwazî	arz ve talep	offre et demande	supply and demand
safî	net	net	net
sala butçeyê	bütçe yılı	année budgétaire	budget year
vexwazî	alacak	créance, crédit	crédit, claim (financial)
yekîne	birim, birlik	unité	unity

F e r h e n g o k a
HAWARê

Amadekar : **Zinar SORAN**

kurdî	**tirkî**	**fransizî**	**îngilîzî**
arok	bir cins köfte	une sorte de boulette farcie	sort of meat ball
avtav	yağmur yüklü bulut	nuage chargé de pluie	rain claoud
bazbazing; bazingê bazûyê	bazı bileziği	bracelet du bras	bracelet
bê ser û saman: perîşan	perişan	désemparé	bewildered, distraught
belgihê derwêşiyê	dervişlik hırkası	manteau rudimentaire du derviche	dervish's cloak
bêlîte, bêlimte, bêrîte, bêrûte	karşılıklı türkü eşliğinde oynanan geleneksel bir kürt oynu	danse kurde traditionnelle executée accompagnée de chants alternés	traditional danse accompanied by al ternating songs
berpêşkî	ön açıklama	préliminaire	preliminary
bi qîma dilê xwe	gönlünce, gönlünün istediği gibi	à sa guise, selon les voeux de son coeur	according to one's heart's desire
bişkoj; bişkov, gupik	tomurcuk	bourgeon, bouton	bud
biqbiqok	su kabarcığı	bulle	bubble
bîrawer; yê ku di bîrê de dimîne	unutulmayan, hafızada kalan	mémorable	memorable, unforgettable
biryan, biraştî	biryan	rôti	roasted
bor, bihur	su geçiti	passage, gué	ford
çandbar	ekilebilen	cultivable	cultivatable, suitable for cultivation
canrevîn	canrüba, gönül kapan (dilber)	qui ravit le coeur,ravissante	soul-ravishing
çarparsû	(taş, ağaç) dört köşeli	équarri	squared
dêmîr	valide sultan	reine mère	the queen mother
dêris kirin	viran etmek	ruiner, réduire en ruines	to ruin, to cause the ruin of
dêris: kavil, wêran	virane, harabe	ruine	ruin
derpêş kirin	göz önüne getirmek, ileri sürmek	mettre en avant, mettre en vue	to put forward
dilrast	dürüst	franc, honnête	honest, frank, straight
dilsar	kırgın olmak, soğumak	distant, déçu	unwilling, disappointed
dilsar bûn	kırgın olmak, soğumak	être deçu, désabusé	to be disappointed
dûmat: musîbet	bela, musibet	calamité, malheur	calamity, misfortune
ekfî	bir çeşit kafkasya hançeri	poignard caucasien	Caucasian dagger

firolek	uçucu	volatile, qui peut voler	volatile, flying
gidêmî	bir çeşit Arap hançeri	une variété de poingard arabe	a kind of Arab dagger
go; gog	ağaç ya da kıldan yapılan küçük top	balle en bois ou en poils utilisée dans le hockey	hockey ball
gulîvk,0 gulik	püskül	pompon	tassel, pompon
heyber	nesne	objet	object
jûvan bûn	pişmanlık duymak, yaptığına üzülmek	regretter, être désolé	to regret, to feel sorry
kavil: kevil, post	deri, post	peau d'animal	skin, undressed skin
kavilandin: kevilandin, kevil kirin	derisini yararak yüzmek	écorcher (un animal)	to skin (an animal)
kilox	kelle, hayvan başı	tête d'animal	animal's head
kudandin	izlemek, peşine düşmek	poursuivre	to pursue
kumribkirî: kumê dora wî bi rib kirî	etrafı çeyrek altın liralarla bezenmiş kadın başlığı	coiffure féminine parée de piécettes en or	woman's hair style adorned with gold coins
lawjebêj: stranbêj	türkü, ilahi okuyan	chanteur (de chants longs ou religieux)	singer, chanter (of long religious chants)
lêk ve bûn	tasnif olmak	se classer, être classé	to be classified, sorted out
lêk ve kirin	tasnif etmek	classer	to classify, to file
mayî	artık	reste, résidu	remnant, residue
navro	ırmak içindeki adacık	îlot situé au milieu d'un fleuve	island (in a river)
nêreng	büyü	magie, charme	magic, charm, enchantment
nesrîn	yaban gülü, Van gülü	variété de rose, rose de Van	a variety of rose, rose of Van
nivandin	uyutmak	endormir	to send to sleep; to lull to sleep
nûsandin: zeliqandin	yapıştırmak	coller	to glue, to stick
nûsîn: zeliqîn	yapışmak	se coller, adhérer	to adher
nûza	turfa, körpe	nouveau né, tendre, frais, jeune	new borne, tender, very young and fresh
piyar	rahim	miséricordieux	merciful, compasionate
piyarî	rahmet	miséricorde	compassion, God's mercy and grace
pizrûk: hûrbaran	çiseleme	brume	mist
qelîsêl	saç kavurması	viande frite sur un plaque métalique chauffée	meat fried on hot sheet iron
qewan: sêlik	müzik plağı	disque de musique	gramophone record
qîr	katran	goudron	tar
qitik	bıldırcan	caille	quail
qumrî	kumru	tourterelle	turtle dove
raçandin	dokumak	tisser	to weave (tissue)
raxer	sergi, mefruşat	meubles, mobilier, ameublement	furniture, carpets
rêman	kavram, mefhum	notion	notion, concept
rik	inat	obstination, entêtement	obstinacy, stubborness
rikdar	inatçı	obstiné, têtu, entêté	obstinate, stubborn
rîşik	saçak	frange	fringe
saman	zenginlik, rahatlık, divan	richesse, confort	wealth , comfort
sergirdan: sergerdan	başı dönen, sersem	qui a la tête qui tourne, ivre, grisé	giddy, perplexed, bewildered, stunned, drunk
sernijdevan	akıncı başı, çete başı	chef de bande	chief raider, gang chief
serpilkî	yüzeysel olarak	superficiellement	superficially
sîngtalde	damlarda kurulan dalda	abri, muret ou cloison construit sur le toit plat des maisons où l'on dort l'été pour se protéger de la vue	shelter, wall or partition on the flat roof of a house behind which one can sleep, in summer, out of sight

Devoka Qerejdaxê

— III —

Amadekar : Mehmûd LEWENDÎ

kurdî	tirkî	fransizî	îngilîzî
hicimîn	hafif aksamak	boiter légérement	to limp, to hitch slightly
hîm; xîm	temel	fondation, fondement	foundation
hînd	bir çeşit döğüş horozu	une variété de coq de combat	a type of fighting cock
hirço-pirço	dağınık, birbirine karışmış tüy veya ip gibi şeyler	emmêlé	tangled
hirhop	hoppala !	vas-y saute !	now then, jump!, what an idea
hirhop	hoppa	écervelé, frivole	flighty, fop
hirîşo	yün yıkayan	lavoir de laine	wool washer
hîro; hêro, xêrî	hatmi çiçeği	rose trémière	hollyhock
histirî: stirî	diken	épine, écharde	thorn, spine
histirîbirk	dikenli bitkileri biç-mekte kullanılan alet	instrument servant à couper les épineux	tool for cutting thorny plantns
histûn: stûn	direk, sütun	colonne, mât, pilier	column, pillar, mast
histûr: stûr	kalın, kaba	gros, grossier	thick, coarse, rude
histûrî kirin	kabalık etmek	se comporter d'une manière grossière,arrogante	to behave in a rude way, with arrogance
hît; çûr	tiftik keçisi	chèvre d'Angora	Angora goat
hîvastin: hevrêstin	örgüyle onarmak	repriser	to darn
hîz; eyarê rûn	yağ tulumu	outre à beurre en peau d'agneau ou de brebis	lambskin for storaging butter
hoç kirin	kalkmak (çocuk dilinde)	se lever (dans le langage enfantin)	to get up (baby talk)
hogirî hev bûn	birbirine alışmak	s'habituer l'un à l'autre, s'accoutumer l'un à l'autre	to get used to one another
hogirî qumarê bûn	kumar alışkanlığı edinmek	prendre l'habitude du jeu	to get used to a game
hol kirin	harman dövmek, harman sürmek	battre la moisson	to thresh
hol: hor	1) harman dövme, harman sürme işi, 2) harman sürme sırasında harmanı daha çabuk sürmesi için hayvana söylenen söz	1) battage 2) allez ! (pour les bêtes de battage)	1) threshing 2) go! goahead (for the threshing animals)
holbûn	şıçramak, fırlamak, zıplamak	bondir	to leap, to jump
hutik; kulm, gumsik, mist	yumruk	poing, coup de poing	fist, blow with a fist
îpilme	ruam hastalığı	vet. morve	glanders
îs, îsik, errik	hayret ifade eden bir ünlem, vay be, abo	oh là là !, interjuction d'étonement	oh dear !
îsk-îsk: îskeîsk	hıçkırma	sanglot	sob
îskîn	hıçkırık, hıçkırma	sanglot	sob

îspat, îspatî	iskambil kağıtlarında «sinek»	carte, trèfle	clubs (cards)
jan	sızı, acı	mal, douleur	ache, pain
jan dan	sızlamak, acı vermek	souffrir d'un mal, éprouver des douleurs	to ache, to suffer sharp pain
jardadayî	zehirlenen, zehirlenmiş	empoisonné	poisened
jardadayî kirin	zehirlemek	empoisonner	to poison
jirra; birra, bi rastî	sahi	vraiment	really, truly
kadiz	samanyolu	voie lactée	the Milky Way
kakil	ceviz, badem gibi yemişlerin içi	cerneau (de noix, d'amande), pas mûr,	halved walnuts, almonds or fruit
kal	yetişmemiş, ham	vert (fruit)	unripe, immature, green
kalo: xalxalik	uğur böceği	cochenille	ladybird
kalome	eski bıçak veya kılıç	vielle lame (de couteau, ou d'épée)	old blade (of knife or wsord)
kalşwîv	nadas süresi bittikten sonra sürülüp ekilen tarla	champ labouré après une période de jachère	tilled or ploughed field after a fallow period
kamaş	kalitesiz tütün	tabac de rebut, de mauvaise qualité	bad quality tabacco
kanîn: karîn, şiyan	yapabilmek, edebilmek	pouvoir	to be able
kapik: pêwend	şerit, kemend	corde	lasso, rope
kapol	ufak ve toz halindeki saman	fétu de paille	chaff, cut straw
karî, kardî	pazı		chard
kawuk	aval, saf	simplet, simple d'esprit, naïf naïveté,	simpleton, fool
kawukî	avallık, saflık	simplicité d'esprit	feeble mindedness
kayik	geviş	rumination	rumination
kedî	evcil	apprivoisé, domestique	domesticated, tamed
kedik	küçük ayran tulumu	petite outre à petit-lait en peau d'agneau	small lambskin for storaging buttermilk
kefkefk: kefkefok	sabun otu	saponaire	soapwart
kel û kût; kal û kût	uyuz, sakat topluluğu, işe yaramayan, değersiz	bande, d'éclopés	bunch of worthless people
kelmîzek, kelmo, kelmisk, mîzek, şetek	altını ıslatan kimse, işeyen	incontinent (d'urine), énurétique	incontinent, enuretic
kelmîzekî	işegenlik	énurésie, incontinence	enuresis, incontinence
kelxwî; kelxweydan	aniden gelen terleme	sueur soudaine	sudden sweat
kun	keçi derisinden su tulumu	outre à eau faite de peau de chèvre	goatskin for water
lîçik; lîk, çilm	sümük	morve	mucus (of the nose)
lîço; lîko, kilmîso	sümüklü, devamlı sümüğü akan	morvœux	slimy, snivelling
likîn	melemek (keçiler için)	bêler, chevroter	to quaver, to bleat
likumîn	sendelemek	trébucher	to totter, to stagger
lîrandin: lîlandin, tilîlî kirin	zılgıt çekmek	pousser des you-yous, des cris de joie d'encourgement	to screans trilling cries of joy
lod	saman veya ot yığını	meule de foin, ou de paille	stack of hay or straw
londer	bir yığın, bir sürü, pekçok	tas, amas	pile, heap

TERMÊN HIQÛQÎ

— VI —

Amadekar : Veysi ZEYDANLÎ

kurdî	tirkî	fransizî	îngilîzî
dayîn, *n*	ödeme, tediye	paiement	payment
dayîn, *l*	ödemek	payer	to pay back (a debt)
deyn dayîn	borç ödemek	payer une dette	to pay back a debt
fît bûn	ödeşmek	être quitte avec quelqu'un	to settle accounts (with one another)
gilîname	şikayetname	plainte écrite	written complaint
gilîdar	şikayetçi	plaignant, demandeur	complainant, plaintive
gilîlêkirî	şikayet edilen	défendeur	defendant
balkişandin	ihtar, ihtar etme	avertissement	warning
balkêşname	ihtarname	notification, avis d'avertissement	official warning
bal kişandin	ihtar etmek	avertir	to warn
mikur, mikur hatin	ikrar, ikrar etme	aveu	avowal
li xwe mikur hatin	ikrar etmek,ikrarda bulunmak	avouer, faire des aveux	to admit, to confess
venasîn, *n*	itiraf	confesser, reconnaître	to confess, to admit
rave	açıklama,izahat, yorum	explication, commentaire	explanation, comment
rave kirin	açıklamak, izah etmek	expliquer, commenter	to explain, to comment
made (ji pehlewî *madeg*)	madde	article	article
xal	fıkra	paragraphe	paragraph
bend	bend	alinéa	paragraph
rêxistin	teşkilat, örgüt	organisation	organization
pardar, pişkdar, behrdar	hissedar	actionnaire	shareholder
beşdarî	iştirak, katılım	participation	participation
hevbeş	müşterek	commun	common, joint
jicihrakirin	sürgün	exil, déportation	exile, deportation
jicihrakirî	sürgün, adj.	exilé, déporté	exiled, deported
ji cih rakirin	sürgün etmek	exiler, déporter	to exile, to deport
desteserî	hacız	saisie	distraint, seizure
desteserkirin	haczetme	saisie	seizing, distraining
desteser kirin	hacz etmek	saisir	to distraint, to seize
desteserkirî	mahcûz	saisi(e)	distrained, seized
destdanînserî	zabt	mainmise, prise	seizure
destdanînser	zabtetme	mainmise	seizuring
dest danîn ser	zabt etmek	prendre, conquérir	to conquer, to take
jêstandin	müsadere	confiscation	confiscation
jê standin	müsadere etmek	confisquer	to confiscate
jêstandî	müsadere edilmiş	confisqué	confiscated
diyarkirin	belirleme, tayin	détermination	determination
diyar kirin	belirlemek	déterminer	to determine
diyarker	belirleyici	déterminant	determinant, determining
diyarkirî	muayen, belirlenmiş,belirli	déterminé	determined

Çend pirsên rastnivîsînê

Reşo ZÎLAN

PIRSA PARASTINA KOKA PEYVÊ :

Herwek gelek zimanên din, di zimanê axaftinê yê zaravayê kurmancî de jî, peyv li hin deveran têne kurt kirin. Di dema bilêvkirinê de ji koka peyvan hin deng, nemaze dengên hin tîpên dengdar, têne daqurtandin. Yan jî ew cihên xwe bi hinekên din re, gelek caran bi riya tewangê, pev diguhirînin. Carina guhartinên wisan mezin dibin, ku mirov nema dikare koka peyvê binase û ji wê tevliheviya ku peyv duçar bûyê, koka peyvê zelal bibîne.

Ji xwe, ferq û cihêtiya di navbera zimanê axaftinê û yê nivîsînê de ew e, ku mirov bi riya zelal xuyakirina peyvan riyê li ber tevliheviyê digire. Bi risteke birêkûpêk, bi nivîskî, pêşçavkirina peyvan riyê li ber çavên xwandevanan xweş dike, da ku ew bêî zor û astengiyekê peyvan nas bike û naveroka hevokê xweş têbigihê.

Helbet feyde û kelka zimanê nivîskî ne bi tenê ev e. Di gel çendîn diyardeyên din, ew rê li ber sergêjiyên devokî jî digire û dibe ho û sedemên afirîna zimanekî standart û xwedînorm. Heçî ev rûyê han ya pirsê ye, ji bo me girîngtirînê ho û sedeman e. Ango em çawan bikin û di nivîsarên xwe de bi çi rengî têbikoşin, ku riyê li ber sergêjiyan bigirin. Çawan hewil bidin da ku zimanê me jî ji aliyê nivîsînê ve bibie xwedînorm û standartekê.

Ji ber vê yekê jî, hewce ye, ku em bala xwe bidin hin qaîde û bingehên rastnivîsînê. Bê guman, ev qaîde û bingeh, li ser bingehên rêzimanê bejin didin. Bêî ku mirov bingehên rêzimana zimanekî bide ber çavan, danîna stûnên rastnivîsîna zimanekî jî ne mumkun e. Li milekî din, pirsa rastnivîsînê ne bi tenê pirseke xweser ji bo zimanê me ye. Lê îro zimanên gelekî pêşdeçûyî jî bi van pirsan mijûl dibin. Lê helbet ne bi qasî me...

Bi kurtî, di warê nivîsînê de, divê em guh bidin parastina kok û qurmên peyvan. Di nav hevokê de, di tewangan de, li kû dibe bila bibe, jê tîpan kêm nekin. Ser û guhên wê neşikênin û dest nedin kok û qurma wê. Bihêlin ew li ser qurma xwe bimîne û welê tişt lê zêde bibin. Bo nimûne:

Li hin deveran, di zimanê axaftinê de dibêjin:

«Ez ê perdekê/perdakê bikirim»,
«Navê zavê me Mendo ye»,
«Zarok li aşxanê ne»

û hwd.

Herwekî di van nimûneyan de jî diyar dibe, ji koka peyvan tîpin hatine kuştin. Peyv hatine kurt kirin. Ser û guhên pirtikên tewangan hatine şikandin. Dibe ku mirov di dema axaftinê de têbigihê, ku merama hevokê çi ye. Lê heçî ji aliyê analîtîk ve lêhurnêrîn e, bi me xuya dibe, ku li gor cihên peyvan yên di hevokê de, di tewangên peyvan de nesazkariyeke mezin heye.

Em nikarin ji peyvên *«perdekê/perdakê»*, *«zavê»* û herweha *«aşxanê»* kok û tewangan ji hev derxînin. Ji ber ku koka rastîn *«perde»*, *«zava»* û *«aşxane»* ye û tewangên wan jî *«-yekê»*, *«-yê»* û *«-yê»* ne. Ango divê bibe *«perdeyekê»*, *«zavayê»* û *«aşxaneyê»* da ku em bikaribin laş û seriyên wan bibînin û wan ji hevûdu cihê bikin. Dibe ku kurtkirina wan, ji hin kesan re xweştir be û bilêvkirinê gengaztir bike. Lê heçî ji bo nivîsînê ye, bi taybetî jî ji bo ferhengnivîsiyê (leksîkografî) ev celeb nivîsîn sergêjiyên bêderman diafirîn.

Ji lewre jî, divê em bal û dêna xwe baş bidin parastina kok û tewangan û wan di nivîsînê de, herwekî ku pêdivî ye, binivîsin. Çend nimûne:

*Ez dê sibehî ji bo serdanê herim **nexweşxaneyê**.*
***Zavayê** mala Berwariyan ji gund vegeriya.*
*Me ji bo odeya rûniştinê **perdeyên** spehî kirîn.*
***Peyayên** axayê me **belaya** xwe bi me didin.*
***Jinbirayên** min ne ji mermalên me ne.*
*De em herin **baxçeyê** cîranê me.*
*Diya min cotek **goreyên** rîsînî dane min.*
*Zarokan **çanteyên** xwe `ecibandin.*

PIRSA TEWANDINA HIN NAVAN :

A) Navên kovar û rojnameyan

Heçî pirsa tewandin yan jî netewandina navên kovar û rojnameyan e, girêdayî pirsekê ye. Ew jî, heke navê kovar û rojnameyê ji navdêrekê pêk hatibe, yan jî heke navê wê bi navdêrekê dawî bêt, divê ew wek navdêrên xwedîzayenda mê bête tewandin. Wek:

*Min ew di vê hejmara **RONAHÎyê** de xwand.*
***SERXWEBÛNê** li ser wê pirsê dinivîsand.*
DENGÊ KOMARÊ
DENGÊ AZADIYÊ
RIYA ŞOREŞÊ
DENGÊ KURDISTANÊ
***ARMANCê** ew wêne weşandibû.*
*Wî ji bo **ÖZGÜR ÜLKEyê** dinivîsî.*
*Di kovara **NOKTAyê** de roportajek heye.*
*Wî di rojnameya **AKŞAMê** de bendek nivîsîbû.*
*Ez nûçegihanê **MORGONPOSTê** dinasim.*
***LE MONDEê** li ser şerê birakujiyê nivîsiye.*
***DAGENS NYHETERa** swêdî rojnameyeke rojane ye.*
***THE GUARDIANê** li ser wê pirsê raporeke piralî weşandiye.*
***KEYHANê** ew nivîsîbû.*
*Ew hîn jî di **EL-CÛMHÛRIYEyê** de kar dike.*
*Wî ew nûçe ji **ÎZVESTIYAyê** veguhastibû.*

Lê heke navê kovar yan jî rojnameyê, ji navê êl û `eşîrêkê yan jî herêmekê pêk hatibe, yan jî bi navekî wisan dawî bêt, ew nahête tewandin. Ji ber ku, di zimanê me de, navdêrên ji navên êl û `eşîran pêkhatî, eger bûbin navên herêman jî, ew çu caran nahên tewandin. Bo nimûne:

*Ez nikarim **DENGÊ MUKRIYAN** guhdarî bikim.*
*Ew nivîsar di **DENGÊ METÎNAN** de belav bûye.*
*Kovara **BOTAN** bi tîpên latînî derdiket.*

Herweha, eger navê kovar yan jî rojnameyê ji rengdêrekê pêk hatibe, yan jî bi navekî wisan biqede, ew nahête tewandin. Ji ber ku, di zimanê me de rengdêr çu caran wek navdêran

nahên tewandin. Wek:

*Di kovara **ROJA NÛ** de çîrokeke wî heye.*

*Di **STÊRKA SOR** de wêneyek hatibû weşandin.*

*Di **KURMANCÎ** de babetên helez derdikevin.*

B) Navên herêman

Herwekî tête zanîn, di zimanê me de, zayenda navên coxrafîk hemû mê ne. Ji ber vê yekê jî, gava ku ew di hevokê de yan jî weke din tên tewandin, divê li gor qaîdeya navdêrên mê bên tewandin. Wek:

*Ez çûbûm **BERLÎNê** û ji wir jî çûbûm **HELSÎNKÎyê**.*

*Ew duh ji **MÛŞê** ber bi **AMÊDÎyê** bi rê ket.*

Ji van nimûneyan jî xuya dike, ku divê navên coxrafîk, li gor tîpên ku nav pê diqedin, divê pirtikên tewangê werbigrin. Ew jî, eger nav bi tîpên bêdeng biqedin, «*-ê*» û eger bi tîpên dendar biqedin, «*-yê*» ne.

Lê di kurdî de hin navên herêman hene, ku ji navên êl û `eşîran, yan jî ji rengdêrekê çêbûne.

Bo nimûne :

Botan, ango herêma Botîyan. Devera ku Kurdên Botî lê dijîn. **Mukriyan**, ango herêma Kurdên Mukrî. Devera ku Kurdên Mukrî lê dijîn. **Behdînan**, **Soran**. **Germiyan**, ku ji hawîrdora Kerkûkê re û **Serhedan**, ku ji bakûra rojhelata Kurdistana Tirkiyê re tête gotin. Hin nav jî hene ku ji du navan çêbûne. Wek: **Dola Şehîdan**, **Newala Guran**, **Girê Sîran**, **Geliyê Zîlan**, **Çiyayê Bêxêr**, **Kevirê Reş** û hwd.

Heçî ev qaîdeya jorîn e, ji bo nevdêrên ku ji navên êl û `eşîrekê, ji du navan û yan jî ji rengdêrekê pêkhatî derbas nabe. Ji ber ku ew navdêr berî her tiştî ji pirhejmarekê pêkhatine û ev yeka han jî cureyek tewang têtê hesêb û nabe ku ew careke din bête tewadin. Wek :

*Şerek li herêma **BOTAN** derketiye.*

*Kurdên **BEHDÎNAN** wek me naaxivin.*

*Zerê çûbû **GELIYÊ ZÎLAN** û lê geriyabû.*

*Mîrê **SORAN** serî li ber dijmin neçemand.*

*Pêşmerge ji **DOLA ŞEHÎDAN** derneketine.*

*Hevalê min ji gundê **QESRIKA PIÇÛK** e.*

*Wî ji **DAREBIYA JORÎN** bar kiriye.*

*Serek Clinton ew di **KOŞKA SPÎ** de kiribû mêvan.*

*Ew duh ji **DELHIYA NÛ** vegeriya.*

Lê ji piraniya wan navdêran rengdêr têne afirandin. Wek: Ji Soran; **Soranî, Sorî**. Ji Botan; **Botanî**, Botî. Ji Behdîndan; **Behdînanî**, **Behdînî**. Ji Mukriyan; **Mukriyanî**, **Mukrî**. Ji Serhedan; **Serhedî**, Ji Germiyan; **Germiyanî** û hwd.

Divê bête gotin, ku hindek navên din yên coxrafîk hene, ku navên hevedudanî ne. Piraniya wan ji nevdêr û rengdêrekê pêkhatî ne. Divê ew li gor qaîdeyê bêne tewandin. Bo nimûne:

*Ez ji gundê **BERDEREŞê** me.*

*Mala me hê jî li **AVŞÎNê** ye.*

*Mala me ji **MÊRGESORê** derketiye û çûye bajêr.*

PIRSA BIKARANÎNA NÎŞANA *BIHNOKÊ Û KU*

Berî her tiştî divê em bêjin, ku ne bi tenê maneyek lê çend maneyên peyva ***KU***yê hene. Ji bo zelalkirina vê pirsê hewce ye, ku em berê wan çend maneyên ***KU***yê bidin zanîn û pişt re vegerin ser pirsa bikaranîna nîşana bihnokê.

Maneyên peyva ***KU***yê, li gor ka ew ji kîjan perçeyên axaftinê têne hesêb, têtê guhartin. Maneyeke peyva ***KU***yê, ku gihanek be, «eger, heke, heger, herke, hek û ger» e. Di zimanê axaftinê de, li hin deverên Kurdistanê ***KU***yê bi vî rengî bi kar tînin û vê maneyê didinê. Maneya didwan, ***KU***ya ku di gel piraniya lêkeran û maneyeka dawîn jî, ku pronav be, ***KU***ya ku di gel nav û navdêran têne bi kar anîn e.

Heçî ***KU***ya ku wek gihanek di maneya «***eger***»ê de ye, bi vî rengî ye:

***Ku** Baran neçûya sînemayê, dê me hevûdu bidîta.*

***Ku** tu neçî, telefonî min bike.*

***Ku** berf barî, em ê perîşan bibin.*

Ango di şûna ku peyva «***eger/heke***» bête gotin, ***KU*** hatiye bi kar anîn û merama gotinê qenc têtê têgihîştin.

Lê ***KU***ya ku wek pronav e, bi vî awayî ye:

*Gulbîna **ku** te dîtibû, xwîşka min e.*

*Karzanê **ku** nexweş ketibû, hîn pak nebûye.*

*Gulên **ku** me tovên wan reşandibûn, hêşîn bûne.*

*Kesên **ku** te duh dîtibûn, mermalên me ne.*

Ev ***KU***yên ku li vir hatine bi kar anîn, hemû jî ji bo veqetandin û ferqêxistina navbera du yan jî çend tiştan e. Yan jî ji bo bêtir balkişandina ser tiştekî ye. Ji ber vê jî, ***KU***yên jorîn, hertim di gel pirtikên «***-an, -ê, -ên***» hatine bi kar anîn. Ango, ji bo manedayîna «***ya ku, yê ku, yên ku***» ye.

Heçî ***KU***ya din e, ew hertim di gel lêkeran têtê bi kar anîn. Pirsa me ya di nivîsînê de rast bikaranîna nîşana bîhnokê jî bi vê deqê ve girêdayî ye.

Di nivîsînê de, divê em bîknokê daynin berî vê ***KU***ya ku em bi lêkeran re bi kar tînin. Ne ku piştî ***KU***yê. Wek:

*Ew di benda xwe de dinivîse, **ku** Bilind bi vî karî rabûye.*

*Ez dibînim, **ku** tu ne li ser riya rast î.*

*Ez bawer dikim, **ku** dê karê me sibehî kuta bibe.*

*Doktor digot, **ku** divê tu hertim guh bidî tenduristiya xwe.*

*Min şîva xwe xwar, **ku** ez dermanên xwe bixwim.*

*Ew çû bajêr, **ku** ji me re hin hûrûmûran bikire.*

Carina, di hin hevokan de, bîhnok dikare bête berî ***KU***ya ku pronav e. Bo nimûne:

*Desteyek hevalên me, **ku li gundê Kanîmasiyê bûn**, di vegerê de rastî çend serbazên Tirk hatin.*

Heke mirov ji vê hevokê perçeya ***ku li gundê Kanîmasiyê bûn*** derxîne jî, di maneya hevokê de çu guhartineke mezin nabe. Ji ber ku hevoka sereke dimîne û tê de kêmasiyeke gelekî mezin peyda nabe û bi tenê zanyariyeke piçûk ji hevokê derdikeve.

Ji milekî din ve, gava mirov hevokê dixwîne, mirov bi xwe jî dibîne, ku berî ***KU***yê rawestîn û piçekî bêhnvedan gerek e. Ji xwe nîşana bîhnokê jî her ji bo vê yekê ye.

Îdyomên kurdî

Amadekar : **Hemîd KILIÇASLAN**
Mustafa AYDOGAN

kurdî	tirkî	fransizî	îngilîzî
aşê betalan	aşırı konuşan	moulin à paroles	chatter box
aşê hawarê, aşê nokan	doymak bilmeyen, sürekli yiyen	insatiable, goulu	greedy, gluttonous
agir bi erdê keve gurzek pûşek wî naşewite	ilgisiz, lakayt,gamsız	indifférent, insouciant	indifferent, have been struck by lod of strokes
agir bi serê me ketiye	başımıza bir bela geldi	un malheur s'est abattu sur nous	we have had a stroke of bad luck
agir li me bariyaye	büyük bir musibetle karşılaştık	une grande calamité nous est arrivée	we have been struck by a disaster
agir xistiye dawa xwe: li fesadî û belaye digere	bela satan, nifak, kavga arayan	il sème discorde et cherche querelle	he is looking for (making) trouble
agir di çava de ye	gözü kan bürümüş	il voit rouge	he sees red
agir ji ber diçe: agir jê dibare; agir ji dêv dibare, agir ji dêv diçe	ateş püskürüyor	il est très en colère	he is spitting fire, he is very angry
agir ketiye	1) paniğe kapılmış, 2) azmış, azgın	1) paniqué, exacerbé, 2) très excité, féroce	1) panic-stricken 2) very agitated
agir li ber kulîna xwe dada: mala xwe bi destê xwe xera kir	evini kendi eliyle yaktı	Il a causé son propre malheur	he caused his own misfortune
agir tê de bûn	(cinsel) ateşli	avoir le feu au cul	having ants in the pants
agirê li heriyê diçe	etkinliği yok, etkisiz, verimsiz	inefficace, improductif	inefficient, unfruitful
agirê pûş	saman alevi	feu de paille	quick, passing, flame or passion
agirê qoçan,	kütük ateşi (tecrübeli yaşlı kimseler için)	peronne âgée et expérimentée	old and experienced (person)
agirê qurman	kalıcı ateş	feu de souche, feu durable, persévérant dans son action	slow burning, persistant, lasting, fire or passion
agirê Xwedê	1) çok çalışkan, çok becerikli, ateş gibi 2) azgın, inatçı	agile, vif, intelligent	agile, intelligent, very quick
alifê vala	1) çocuk yapamayan, kısırlaşmış kadın 2) başı olmayan ev, aile	1) femme qui ne peut plus enfanter 2) famille sanschief	1) a woman who is past child-bearing 2) family without a chief

aqil berdan	kafayı takmak, sevdalanmak	être obsédé par	to be obsessed by
aqil bi ser kum ketiye	aklı havada	qui a la tête dans les nuages	scatterbained head in the clouds
aqilê sivik, barê giran	baş belası,	casse-pied,	irritating, pestering,
ardê cehînî	1) bitmek bilmeyen 2) kalitesiz	collant	a pest
arvanê sala teng; arvanê sala xerab	kara gün dostu	ami des jours d'ad- versité, ami fidèle	faithfully friend, friend of hard times
arvanê xwe li êş kir; a xwe got; got ez jî heme	boş konuştu, o da ağzını açtı	il a dit son mot aussi	he also has said his word
asasê ser berfê: **xîma ser cemedê, xîmê ser avê**	temelsiz, kum üzerinde kurulu (şato)	sans fondement, bâti sur la neige	baseless, unfounded built on snow
av di gunikên wî de wergeriyaye: av li şeko- kên wî geriyaye: balix bûye	ergenleşmiş, ergenliğe ulaşmış	il est devenu pubère, il a atteint la puberté	hi has reached puberty
av li ser xwe zelal kir	sessiz kaldı, izini kaybettirdi	il est parti pour revenir vite, mais n'est pas revenu	he bas gone for a a short time but he is not back
ava bin kayê: kesê ku tiştên xwe bi dizî	içten hesaplı, sinsi	calculateur, sournois	crafty, cly calculating
ava buhurekî; pîvazê mişarekê ; ji eynî malî	aynı bezin parçası	de même eau, du même acabit	in the same style, of the same type
av ji dev çû; gilêz ji devê wî hat	ağzının suyu aktı	ça lui a mis de l'eau dans la bouche	it made his mouth water
ava qûna cêr : çi qenciyê pê dike, bê feyde ye	beyhûde emek	vain effort	wasted effort
ava reş bi çavan de hatin: kor bûn, nedîtin	görmemek	être aveugle	to be blind
ava serî germ kirin	suyunu ısıtmak	préparer la fin de quelqu'un	plot someone's end or downfall
ava rû: abrû, **avrû:** heya	haya	vergogne	shy
ava rû teqandin an **qetandin**	hayasızlaşmak	devenir effronté, sans vergogne	shameless, become shameless
avpizavî kirin: ji bo zarok an pezên ku ji ber nexweşiyê xwarin naxwin tê gotin	iştahsızlaşmak, hastalık nedeniyle yemek yemeyen çocuk ya da hayvan için söylenir	perdre l'appétit se dit d'enfants ou d'ovins n'ayant pas d'appétit pour cause de maladie	to loose one's appetite said for children or sheep who have has lost their appetite through illness
aviya kulîlkê: yek li pey yekî çû û nehat avî çûyin	ardı ardında gidip gelmeden kaybolmak	aller un à un à la recherhce de quelqu'eun et ne pas revenir	to go one by one tech s.o. and not to come back
ax bi çavan ketin	hayıflanmak, kaçırılmaması gereken fırsatı kaçırmak	déplorer une belle occasion ratée	to regret missing a good opportunity
axa bin gû: bi kêrî tu tiştî nayê	hiç bir işe yaramayan, değersiz	vaurien, vil, sans valeur	good for nothing, worhless
axurê xwe xera kirin: bi nanê xwe leyistin	bindiği dalı kesmek, çıkarına aykırı hareket etmek	couper la branche sur laquelle on est assis, agir contre ses intérêts	cutting one's own throat, acting against one's own interests